Êzimk

XORTEKÊ KURD WÊ BIPEQE!!

Salih Xazî

Ez li pişt mêzeyê rûniştibûm, mijûlî nivîsîna babetekê edebî bûm. Silava xortekê herzekar serê min bilindkir. Min dît xortekê xwîngerim bi serûrûyekê xwemalî û erzinkeka saksokî li hindav serê min bûye gilç. Min bi rêz ve, gotê: kerem bike! Ewî bê rawestyan, bersiva min da û got: ez hatime layê te, daku navê min binivîsî ku ez amademe li berahiya debabeyên Tirkan xwe bipeqînim, her çende ev nekarê min e, û çu cih bo wê mebestê nehatine vekirin. Ez bi vê axavtinê sersurman bûm û min bêhnekê sehkire vî gencê xwîngerim ku bêhna bêzariyê û westyanê jê dihat. Min bersiva wî da, min got: Mixabin tu ev gencê xwîngerim û nazik û te paşerojeke li ber e, hewil bide karekê bike ku tu li ayînedeyî bextewer bibî neku xwe bipeqînî, paşî tu dizanî ev karê ji vî rengî çi ye? Tu dizanî di keve di xaneya terorê de? nabe tu van hizran bikî. Evî gencî bi aramî û dûr ji helçûnê bersiva min da, got: Ez dijî karên terorê me û çu caran min ew hizir nekiriye, belê dîtina min, ev karê ez dixwazim bikim nabe terror, belku ev berevaniye ji axa min, ev axa sedan hezaran gencên wek min xwîna xwe bo rijandî. Ev roj jî ez amademe bo vê axê xwe bikime qurban û bersingê her hêrişeka hêzên Tirkî bigirim.

Piştî ez bo vî gencî axiftîm, min şiya ez berê wî ji karê peqînê biguhorim. Şûna peqandinê li sengerê berxwedanê, berevaniyê ji axa xwe ya pîroz bike. Li dawiyê bi mercekê razîbû ku ez navê wî binivîsim, ew êkem kes be li berahiya hêzên dagîrkeran rabiweste, ez bi bawer im ku evro li Kurdistanê bi milyonan kes hene ku beranber her êrişeka dijminan sengerên berxwedanên, dê çûk vedin heta dûmahîk çipka xwîna berevaniyê ji vê axê bike. Ev axa ku xelkê wê, sedan sale xwînê bo dirêjin evro bi xwîna xwe dê wê axê parêzin.